Tiştê ku Thuringê bi dest xistîye

Thurîng baş pêşketiye. Di vê peşketinê da para gelek kesan heye. Em, bi ser 100 da ji kesên di bazara cîhanê de biserbilind in. Li ser tiştên ku kedkarîya me ji me ra pêşdixîne. Û bi taybetjî em dikarin bi jinên ku di pîşesazîya xizmetguzariyê da, di hemşîretiyê da, li beşên nexweşxaneyan û di pratîkan da û hem jî di nav malbatan da serdestîya jiyana rojane dikin, serbilind in.
Ji cotkar û daristvanan ra, ji her kesên ku me bi virda û wurda didomînin. Mamoste û lêkolîner, hunermend û xebatkarên çandê, werzîşvan. Em jiyana xwe ya baş deyndarê xebatkarên di dayreyên îdarî da kar û memurtî dikin, her kesê ku li ser xwebexşî çalak e û yên ku bacê bi durustî didin.

Ka em biaxivin li ser dewleta me ya Azad dê ewê çawa bikare hîn çêtir û baştir bibe – ji bo her kesên ku li vir dijîn. **Em ê hemî pêşvebirina Thuringa-xwe bidomînin: bi Mirovî. Xûrt. Adîl.**

Karê baş û aborîya xurt (serkeftî)

Thurîng her tim ji keda gelek kesên çalek dijî, hem ji kesên herêmî û hem jî kesên nûhatine li vir jiyanê didomînin. Îcatvanên ji bo tevahiya cîhanê ku her kes pê dizane: lêystika Skat, firçeya diranan. Dîrokniviskar Zeiss Jena, Bauhaus Weimar.

Îro her kes dizane: Pêdivîya me bi pîşesazîyek pêşerojê û xebatkarên ustayî heye.

Bes ew tenê ji bo miaşên maqul, karê baş û beşdarbûna zêde bi xwera tine. Ji bo binesazîyek bikêrhatî, pêdivî ye ku zarok li kreş û dibistanan li wan baş nihartin, riya pizîşkan kurt be û înternet bilez be. Zanist û lêkolîn ji bo nîştecîh û veberhênanên nû girîng in.

Pêdiviya me bi çandiniyê heye ku pêdivîyên herêmê xurt bike û karan misoger bike. Û li ku derê dibe bila bibe em ê arseyên (erda) xwe li di ji firotinê biparêzin.

Germahî û enerjiya erzan

Ma divê mirovên li Dewleta me ya Azad ji fatûreyên enerjiya xwe fikaran bikin? Em bawerin: Na, elektrîk û germahî divê erzan bimînin! Ji bo vê yekê dabînkerên şaredarîyan, germkirina navçeyan û kooperatîfên enerjiyê girîng in. Plana me ew e ku em sûdê ji pergalên enerjîya bayê û rojê li herêman bihêlin.

Tiştek ji bo me qanûn e: em tenê dikarin bi hev re vegu-herîna enerjiyê bi dest bixin. Gav bi gav, her yek li gorî îmkanên xwe em ê bigihîjin armanca xwe - an em ê têk biçin. Em fikrên ên Berlînê yên ku ji rastiyên xwe durin li welat paşguh dikin red dikin û emê di Konseya Federal de jî red bikin.

Thurînga me.
Mirovî. Xûrt. Adîl.
Programa Hukumetê
ya ji 2024 heta 2029

www.die-linke-thueringen.de/
regierungsprogramm2024

Partîya Die Linke
Saxa Eyeleta Thurîng
Eugen-Richter-Straße 44
99085 Erfurt

Telefon: 0361-60 111 30
Fax: 0361-60 111 41

lgst@die-linke-thueringen.de
www.die-linke-thueringen.de

V.i.S.d.P. kesê berpirsê bo mafê ragihandinê yê: René Kolditz
Wêne: Jannis Schulze

Civakî û ewlehî

Malbat neçarin ku barên giran bixwera tînin – taybet jî jin – hefte bi hefte ji bo hevsengiya kar, mezinkirina zarokan û karên malê yên rojane. Em wan ji barê kreşên zarokan ên bêtevger sivik dikin, cîhê jiyanê û kirê digirin û gelek feydeyên civakî yên ku piştgirî û ewlehiyê di jiyana rojane de û bi taybetî di rewşên krîtîk de pêvîste, peyda dikin.

Ji bo me ev eşkere ye: Divê têra xwe ji her kesîra hebe, ku bikaribe di civaka me de bi rêk û pêk bijî. Em hîn li Thurîngê jî ji vêya gelek dûr in ku bigihîjne van armancan. Ger hên Koalisyona Ampel ya li Berlînê dewleta sosyal, tevî hemû bacên me, qut bikin, rewş ji bo gelek kesan dê baştir nebe. Ji ber vê yekê em bi zelalî ji zêdekirina temenê teqawidbûnê re dibêjin na û di nav partiyan de – bi taybetî ji bo Rojhilat – dengê civakê ne!

Garantiya tevgerê çuyînhatinê

Mirovên li welatek mezin mîna Thuringê neçar in ku mobîl bin. Rêyên wê dûr û dirêj in, ger dema ku dikanên herêmî ji hev dûr bin, wekî dikanên xeratîyê, bi taybet jî praksisên pijîşkan. Çuyînhatina bo gundan tenê bi otomobîlan mimkûn e. Û di pêserojê da bi jiyanekî hesanî û rihet jî bo çuyînhatina herderê Thuringê bi otomobîlên Mix yên elektrik, Otobus û Tirênan, Otomobilên kirêkirî, Taxiyên (taqsî) hevbeş û çuyînhatina bi hevduva girêdayîheke mimkun be. Plana me ji bo vê: Bi arzanî û bi hêsanî çuyinhatin!

Tenduristî û lênêrînê

Çênabe Tenduristî li ser borsayê be. Lê ew e. Pargîdan û bi taybet tucarên mezin diyar dikin ka li pirayên klînîkan çi biqewime û qîmeta bihayên li dermanxaneyan çi be. Ev bu demek dirêj, ku em têdikoşin, da lênihêrîna tenduristiyê dîsa têxin destên gel. Niha girîngî bo me ew e, ku şert û mercên wê bên başkirin.

Karker hewceyê bêtir waxt û miaşên baş in. Bo her nexweşxaneyan jî! Em nabînin ku girtina wan bi kêrî nexweşan bê. Plana me: Divê bo çuyînhatina praksîz û dermanxane rehet û hêsan be. Û çihê ku derft nîn be, dê hemşîreyên civakî bên.

Mayina li vir

Gelek hemwelatiyên me ji sala 1989-an vir ve ji Thuringê koçberî kirine – di aborî û di malabatê da ne dîyarin. Lê berê jî di dîrokê da her wisa bu. Dema li gundan jiyan nû destpêdikir, mirovên ji derva ji herêmên din dihatin û dixebitîn. Bey vê hêza xurt – em li Goethe û Schiller bifikirin – klasîkên edebî tunebûn; Bauhaus li Weimar û Zanîngeha Jena navendên navneteweyî bûn.

Ji bo ku li welatê me danûstendin bê kirin, di warên wekî derman û lênêrînê an jî gastronomiyê de, pêwîstiya me bi destê her kesî heye! Ev dikare perwerdê baş û serkeftî bike, kirêya xanîyan erzan bike, miaş û çuyînhatin hêsan bo kar ji hemû kesîra, yên ku tên cem me bo xebatê. Berî her tiştî, xêrhatinekî kefxeşî bide nişandan û rêzgirtin bo wan hebe.

Perwerdehîya baş

Pêşeroja Thurîngê zarokin. Kesê ku ji vê yekê fêm neke bila welat îdare neke. Plana me: Divê perwerde bêpere be – ji kreşê bigre heya asta masterê an. Em bi hev re demên hînbûna dirêjtir û rêyên kurt ji bo dibistanan dixwazin. Divê hemû zarok xwedî derfetên wekhev bin. Ev hewceyê hawîrdorên dibistanan geş û çalekî, cîhên baş ên bi binesazîya fonksiyonel hewce dike. Paşê mamosteyên ciwan û nû tên û dimînin.

Ya ku ji me re jî girîng e ew e ku dibistan û navendên werzîşê ji bo zarokên me cîhên ewle be. Ger memur û karker perwerda baş girtibe û rêzgirtin li hev bigrin, bawerî bidne hev û hevdu teqdîr bikin, wêhingê dê dêûbav bi dilekî xweş zarokên xwe teslîmê cihê lênêrînê bikin û bihêlin. Ji bo me, hişmendî ne tiştek nû ye, lê rêgezek danûstendina mirovahîyê ye.

Di van salên dawî da gelek fikaran bixwera anî. Digel vê yekê jî, li vir li Thuringê yek ji me jî gav paş navêt. Ji bo vê yekê em spasdar in û pêşerojê li ser vê ava bikin: **da ku Thurîng hîn çêtir û baştir bibe – ji bo her kesê ku li vir di malê da dijî!**